Sitrana ‘Anê min pêde’ li xweşiya Fînlandiyan diçe!

Mihemed ELÎ

efrin2612@hotmail.com

Sitarana, ku hunermendê Kurd ji herêma Efrînê Ebdo Mihemed van rojan bi saya wê li ezmanên Fînlandayê perwazên navdariyê dide xwe, sitraneke gelêrî ango ji zargotina Kurdan e. Ev zargotin jî mixabin ta roja îro bûye goriyê nezanîna nirxa wê ji hêla Kurdan ve. Di encamê de rê ji nijdevanên çandan re vebûye ku bi serbestî heyîna wê bikin mafê xwe û ji Kurdan re nadir bikin.

Heke mirov ji xwe bipirse, gelo çima ev sitran ewqas li xweşiya Fînlandiyan diçe, çima ew vê rûmeta nebêj didin Ebdo Mihemed? Hingê divê mirov kêliyekê li dîroka Fînlandayê vegere, da ku mirov bizanibe çi wateya folklore di avakirina kesayetiya netewî ya vî welatî de heye.

Fînlandî ne ewqas kêfxweş in ji ber dengê Ebdo Mihemed dilê wan biriye û an jî meqamê ku ew sitranê pê vedibêje ewqas hişbir û dilbir e. Ya rast ew e ku Fînlandî bi jêderk û wateya gotinên sitranê kefxweş in. Ew bi alavên ramîna Kurdan mendehoş in, ku ewqas berhemine yekta û bêqam derxistine holê. Fînlanda îro di cîhanê de welatê pêşeng e ku ewqas meraq û puteyê, ne tenê bi zargotina xwe, lê bi zargotina hemû gelên cîhanê dike, nemaze jî zargotina bêxwedî maye! Fînlandî ji ezmûma xwe ya kesane dizanin folklore dikare ta çi radeyê raje û xizmeta berzkirina hemû nirxên neteweyekê di cîhanê de bike. Ew dizanin ku di her berhemeke folklorî de hin hêmanên nepen hene, ku mirov bikare wateya wan pen bike, havilên bêsînor ji şaxên cihêreng ên jiyana mirov re derdikevin holê. Kî dizane heke Fînlandiyan ev sitrana gelêrî lêkolîn nekiribe û encamên wateyên hêmanên ku di xwe de dihewîne nexistibin rajeya gelê xwe?

Ne tenê Fînlandî, lê hemû gervanên (torîstên) Eworpa tên nav Kurdan, ku hişmendî û metodên Kurdan di jiyana xwe ya civakî, aborî û derûnî de bi kar anîne, tomar bikin û piştre li taqîgehên welatên xwe sorax bikin û encamên wateyên van heyberên zargotinî têxin rajeya gelê xwe. Îro bi nebûna hişmendî bilyaniyeke netewî ji berhemên zîrekiya pindara gelê Kurd re, ku ev heyber bi teşeyekî xweser bi nêrîna xwe ya kesane ji cîhanê re afirandine, Kurd derfetê didin du cure dijminan bi du niyazên qirêj ku bi ser gencîneya wan de werin û wan bêdeng û bi fêlbazî ji wan bidizin. Piştî dizînê jî ev herdu dijmin angaşta arziya van berheman dikin û qezencên nebêj jê werdigirin!

Dijminê yekemîn ew kesên ku xwe di cilên gervanan de vedişêrin û berê xwe ji hemû welatên Ewropa û Amerîka didin welatê Kurdan û bi navê vedîtin û parastina bermayeya gelan berhemên Kurdan ji bo dizîneke sipî! Ev gervan berhemên şênber serax dikin û yên razber jî tomar dikin…

Du mînakên biçûk ku ez bi xwe dîtbarê wan im, vê rastiyê dipeyitînin:

- Carekê jin û mêrekî Baljîkî, ku qaşo lêkolîner in, bi behaneya lêkolînekê li ser biwarên çandinê li herêma Efrînê li gundekî ji gundên, hema bêje, hemû cotkarên gund civandin û bi kitekitî ezmûna çandina zeytûnan ji dema ku ew hêj qurm in heya ku dibin êzingên argonê ji wan pirs kirin! Hemû kitekit bi baldarî dihatin tomarkirin, çi deng, çi dîtbarî û çi nivîsandin.

- Mînaka duyemîn jî keçikeke Firansî bû, ku bêtirî sê salan li herêma Efrînê ma, ku qaşo doktoroya xwe di xwarinên Efrînê de çêdikir! Gelo ma pêdiviya Firansayê bi xwarinên Efrînê heye!? Lê rastî ew e, ku ev karekî pergalane ye ji bo ev xwarin werin veguhestin û li Firansayê raza wan were kifşkirin, navekî din ji wan re were dayîn û li dawiyê bibe arziya Firansiyan heya bikaribin havilên aborî û rûmetî ji xwe re jê werbigirin? Ev hemû kiryar jî – tevî ku dezgehên dizek dizanin- li dijî rêbaz û zagonên dezgeha navnetewî ya paratina berhemên gelan in. **WIPO**[1]

Dijminê duyemîn jî dagîrkerên Kurdistanê ne, nemaze Tirkiye, Sûriyê û Îran. Her yek ji van welatan hewl û bizav dike ku hemû rengên zargotina Kurdan bidize û yên ku nayên dizîn jî wêran bike. Mînakên dizînê pir in: ji muzîkê û gotinên sitranên gelêrî bigire heya cureyên cil û bergan, hilperîn û berhemên destekarî… Jixwe Tirkiyê ji zû de û bi teşeyekî pergalane bi vî karî radibe û heya radeyekê jî di karê xwe de serkeftî ye. Lê tiştê nû ew e ku Sûriyê teze ketiye vê rêya hanê, nemaze di warê dizîna berhemên hunerî de wek hilperîn û mûzîkê. Li vê dawiyê bi dehan rêzefîlmên Sûriyê ku naveroka herikîna wan bi mûzîka kurdî dagirtiye, bêyî ku derhêner tu amajeyên dûr an jî nêzîk bi jêderka vê mûzîkê bike! Hêjayî gotinê ye ku hin caran rêzefîlmên Sûriyê hin parçeyên mûzîkê –ku qaşo Tikî ye, lê tirkan jî wisa ji Kurdan diziye- vediguhêzin bêyî ku ji bîr bikin binivîsin ev "mûzîk ji muzîka Tirkî hatiye veguhestin,,

Ev mînakên li jor şêwazên dizîna folklore dinimînin, ema tiştên ku nikarin werin dizîn jî hin şêwazên kuştina wan ji hêla van dagîrkeran ve hatine dahênan. Wek mînak qedexekirina axaftina kurdî, guhertina navê bajar û gundan û astengkirina derfetên bikaranîna berhemên zargotinî,W. M. Dawet berê li Sûriyê rengekî pen û dewlend ji rengê bicihanîna berhemên zargotinî bûn, lê niha piştî ku dugela Bees destê xwe xistiye nav civakê û bi alîkariya hêzên xwe yên tarî hemû derfetên lidarxistina van dawetan têkbirine û vê bi dehan fêr, dab û nêrîtên ku di wan dawetan de dihatin bikaranîn kuştine. Ev jî wek kiryarên Ewropiyan li dijî hemû bend û zagonên dezgeha navnetewî ya parastina berhemên gelan in. **WIPO**[1]

Pêşiyên me gotine 'malê beredayî fêrî dizînê dike. 'Mixabin wisa bi serê me Kurdan hatiye. Me hêmanê herî girîng ku kesayetiya me dabîn dike piştguh kiriye û ev mal bûye meydana çeqel û roviyan! Ka çend rêxistinên Ewropî yên angaşta parastina çandên gelan dikin li dijî kiryarên dagîrkerên kurdistanê û nijdevanên çanda wê derketine? Ji dêvla wê, vaye ew jî pisporên xwe di cilên gervanan de vedişêrin, da ku têkevin karwana nivdevanên çanda Kurdan! Dijmin dijmin e û hemû reftarên wî li gorî bîrdoza wî behanekirî ne. Kesên gunehkar em Kurd bi xwe ne. Ka em bi çi rengî xwedî li alav û amûrên ku çanda me di dil û mûjiyê me de diparêze derdikevin?

Ka em rewşenbîrên xwe beramberî rewşenbîrên Kurd di destpêka sedsala 19'an de bikin, nemza kesên wek *Reşîd Law* û *Hilmî Sivereklî,* ku rojnameya *hetawî kurd û jîn* derdixsitin http://www.pen-kurd.org/kurdi/Mihemed-Eli/bapiren-me-chawa-zargotina-me.html. Îro çend rewşenbîrên me çêrî Cemîl Horo, Eliyê Kapê an jî Elî tico dikin? Ev camêrên navborî sitêrkên

ronahiya herman a çanda me ya gelêrî ne, tevî hemû rengên hovîtiya Bees, heya roja dawiyê ji temenê xwe û heya dilopa taliyê ji xwîna xwe li gencîneya me xwedî derketine. Îro jî em ji Ebdo Mihemed re didin çepikan û dikin tilîliyan! Bila em biçekî biponijin û sexbêr bibin, ne dengê Ebdo Mihemed li xweşiya Fînlandiyan diçe, ya rast wateyên sitranê li xweşiya wan diçe! Hêjayî gotinê ye, ku Ebdo Mihemed Sitran ji şêwazê resen ku Cemîl Horo distire derxistiye!

[1.] (World intellectual property organization) http://www.wipo.int/portal/index.html.en. Dezgeha navnetewî ya parastina berhemîn gelan, encama herdu peymanên Bern û Parîsê yên parastina berhemên şarezahiya gelan in. Di 26 Nîsana 1970 an de ev dezgeh hat damezirandin und lo gorî benda 3 a peymana vê dezgehê "ArmancaWIPO ew e ku berhemên zîrekiya gelan li seranserê cîhanê bipêş bixe û biparêze…". Ev dezgeh di sala 1974 an de bûye gewdeyekî pisporande di çarçoveya neteweyên yekgirtî de.